

RÊBERA  
HÎNKIRINA  
KURDÎ

JI BO MAMOSTEYAN

# AGAHİYÊN ÇAPÊ - IMPRESSUM

Ev pirtûka Rêbera Hînkirina Kurdî - Kurmancî bi piştgiriya Wezareta Çandê ya Swîsreyê (BAK) û Xwendegaha Bilind a Pedagojî ya Zurichê (PHZH) çêbûye.  
Dieses Handbuch entstand mit der Unterstützung des Schweizerischen Bundesamtes für Kultur (BAK) und der Pädagogischen Hochschule Zürich.



PÄDAGOGISCHE  
HOCHSCHULE  
ZÜRICH



Schweizerische Eidgenossenschaft  
Confédération suisse  
Confederazione Svizzera  
Confederaziun svizra

Das Eidgenössische Departement  
des Innern (EDI)  
Bundesamt für Kultur BAK

Navê pirtûkê, Titel:

RÊBERA HÎNKIRINA KURDÎ YA BIKARANÎNA  
21 PIRTÛKÊN HÎNDEKARIYA KURDÎ, LI DERVEYÎ WELÊT

GRUNDLAGENHANDBUCH ZUR ANWENDUNGSUNTERSTÜTZUNG  
DER 21 KURDISCHEN LEHRMITTEL IN DER DIASPORAONSEQUAM

Birêvebiriya projeyê, pêrebûna pedagojîk,  
Projektleitung und  
pädagogische Begleitung

Zeliha Aktas (PHZH)

Nivîskar, Autor:innen:

Basil Schader, Bilge Süme-Ben Mansour, Davut Yesilmen, Hewrê Zargana, Markus Truniger, Mesut Arslan, Michael Chyet, Münevver A. Bazan, Petra Hild, Resul Geyik, Roni Stêrk, Sehmuz Kurt, Serif Derince, Veysi Dag, Zaradachet Hajo

Hînkar, Lehrpersonen:

**Vorschul- und Unterstufe:** Irfan Arslan, Zübeyir Sizici  
**Unterstufe:** Hesen Huseyîn Denîz  
**Mittel- und Oberstufe:** Hasan Keles, Mahmut Altun

Çavdêr, Feedback:

**Vorschul- und Unterstufe:** Hesen Huseyîn Denîz, Mesut Tufan  
**Unterstufe:** Beriwan Kahraman, Hasan Şahin  
**Mittel- und Oberstufe:** Beriwan Kahraman, H. H. Denîz

Plansazî, piştgiriya pedagojî û pisporên  
beşan: Planung, pädagogische unter-  
stützung und Fachexpert:innen:

Zeliha Aktas, Hesen Huseyîn Denîz

Dîmengirî, Videoaufnahme:

Yusuf Yesiloz, Barzan Guneş

Werger, Übersetzer:innen:

Abdulkadir Ulumaskan, H. H. Denîz, Münevver Azizoglu Bazan

Edîtorî, Redaktion:

Davut Yesilmen, H.H. Denîz, Münevver A. Bazan, Zaradachet Hajo

Rûpelsazî, Layout:

Hesen Huseyîn Denîz

Çapa yekê, Erste Auflage:

Kanûn/Dezember.2023 - www.leodruck.com

© Mafê weşanê: Bi alîkariya Komeleya Hîndekariya Kurdî, weşana Instîtuta Kurdî li Swîsreyê - 023  
Herausgeber: Kurdisches Institut Schweiz, mit Unterstützung vom Verein für Kurdischunterricht - 023  
© Alle Rechte vorbehalten

ISBN: 978-3-03949-023-3

Têkilî, Kontakt: info@institutkurdi.ch

Sazî û rêxistinên li jêr piştgirî û hevkarîya van rêzepirtûkên hînkirina zimanê dayikê,  
Kurdî - Kurmancî li derveyî welêt dikin.

Das Grundlagenhandbuch zur Anwendungsunterstützung der kurdischen Lehrmittel in der Diaspora in Kurmancî  
Kurdisch wurde von folgenden Institutionen und Organisationen unterstützt und begleitet:



Institutkurdi - Swisre

Kurdisches Institut Schweiz



Komeleya Hîndekariya Kurdî

Verein für Kurdischunterricht



Yekmal - Yekîtiya Malbatên ji  
Kurdistanê li Almanyayê

Yekmal - Verein der Eltern aus  
Kurdistan in Deutschland e.V.



Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Ewropayê

Verein Kurdischer Lehrerinnen In Europa E.v.



Navenda PENa KURD

KURD-PEN Zentrum

# NAVEROK

Pêşgotin - <b>Zeliha Aktas</b> - Birêvebiriya projeyê	4 - 5
Destpêk - <b>Markus Truniger</b>	6 - 7
<b>BEŞA YEKEM</b> <b>DI REWŞA KOÇBERIYÊ DE XALÊN BINGEHÎN ÊN HÎNDEKARIYA ZIMANÊ YEKEM</b>	<b>9</b>
1.1 Rol, Wate û Taybetiya Hîndekariya Ziman û Çanda Welêt a di mijara pirzimanî û pirçandî ya koçberiyê de - <b>Basil Schader</b>	11
1.2 Ji bo Zimanan Çarçoveya Pêşniyarên Hevbeş ên Ewropayê - <b>A. Kadir Ulumaskan</b>	17
1.3 Konseptên Zimanê Yekem, Zimanê Duyem û Pirzimanîyê - <b>Şehmus Kurt, Şerif Derince, Roni Stêrk</b>	35
1.4 Perspektîfa Wekheviya Zayendî - <b>Münevver Azizoglu Bazan</b>	53
1.5 Hînkirina Kurdî wek Zimanê Yekem: Rê û Rêbazên Hînkirinê - <b>Şehmus Kurt, Resul Geyik</b>	61
<b>BEŞA DUYEM</b> <b>ZIMANÊ KURDÎ, DÎROKA WÎ, RÊZIMAN û TAYBETIYÊN WÎ</b>	<b>73</b>
2.1. Bipêşdebirin û dîroka zimanê kurdî, taybetiyên zimanê kurdî - <b>Resul Geyik</b>	75
2.2. Rêzimana kurdî, alfabe-yên cûrecûr, zarava û awayên axavtinê, taybetiyên zimanê kurdî - <b>Michael Chyot</b>	93
2.3. Li welatên cuda rewşa niha ya zimanê kurdî - <b>Veysi Dag, Roni Stêrk</b>	107
2.4. Xwendegeha Rojîn a Munichê, pergaleke nû ya xwendegeha pedagojîk: "huner û dîrok wek bingeha afirînêyê û ramana azad".- <b>Hawrê Zangana</b>	127
2.5. Hevkariya bi dê û bavan re ji bo dersên zimanê dayikê - kurdî - <b>Şerif Derince</b>	145
2.6. A Wêjeya nûjen a kurdî: derfey, rê û rêbaz û berxwedan - <b>Davut Yeşilmen</b>	155
2.6. B Destpêkek ji bo edebiyata kurdî ya klasîk - <b>Mesut Arslan</b>	171
2.6. C Wêjeya zarokan a kurdî - <b>Mesut Arslan, Davut Yeşilmen</b>	187
<b>BEŞA SÊYEM</b> <b>BIRÊVEBIRIN û PÊKANÎNA PIRTÛKÊN HÎNDEKARIYA KURDÎ YA ZÇW</b>	<b>203</b>
3.1. Rêzêpirtûkên hînkirina zimanê kurdî-kurmancî û pêrebûna zanistî û awirek li avayiya wan - <b>Zaradachet Hajo</b>	205
3.2. Di HZÇW de kalîte û şarezahî, di çarçoveya pirzimanîya koçberiyê de - <b>Petra Hild, Zeliha Aktas</b>	229
<b>3.3. Hevsengiya bi planê hînkirinê 21 û çarçoveya planê hînkirinê yê ZÇW re -wêger ji ber Planê Hînkirinê 21 û Çarçoveya Planê Hînkirinê - HSK</b>	<b>273</b>
3.3. A Dersa mînakî ji bo asta berî xwendegehê - <b>Hesen Huseyn Deniz</b>	293
3.3. B Dersa mînakî ji bo asta jêrîn - <b>Irfan Arslan, Zübeyir Sizici</b>	319
3.3. C Dersa mînakî ji bo asta navîn - <b>Hasan Keleş, Mahmut Altun</b>	341
3.4. A Pedagojiya medyayê, derfet û xetereyên medyaya dijîtal- <b>Bilge Süme-Ben Mansour</b>	363
3.4. B Bikaranîna medyayê û rola dê û bavan - <b>Münevver Azizoglu Bazan</b>	377
3.5. Bikaranîna adaptêkirina wêjeyê di hînkirina zimanê kurdî de - <b>Resul Geyik</b>	385
<b>FERHENGOK</b>	<b>397</b>
<b>PÊVEK - ANHANG</b>	
Anhang I - Rolle, Bedeutung und Spezifik des HSK/HSU - <b>Basil Schader</b>	409
Anhang II - Wissenschaftlicher Begleitsbrief - <b>Zaradachet Hajo</b>	412
Anhang III - Was bedeutet es, als HSK-Lehrpersonen in der Schweiz zu unterrichten? - <b>Petra Hild, Zeliha Aktas</b>	428
Inhaltverzeichnis (DE)	460

2.6.A

## WÊJEYA NÛJEN A KURDÎ DERFET, RÊ Û RÊBAZ Û BERXWEDAN

---

DAVUT YESILMEN

# NAVEROKA NIVÎSÊ

Rêz	Sernivîsên di vê gotarê de	Rûpel
1.	Destpêk	157
2.	Pêşveçûnên Wêjeya Kurdî	157
3.	Wêjeya Kurdî li Sirgûnê	160
4.	Wêjeya Kurdî-Êzîdî li Yekîtiya Sovyeta Berê	161
5.	Diyaspora	163
6.	Berxwedana Wêjeyê	166
7.	Encam	168
8.	Çavkanî	169

## 1. Destpêk

Ev gotar bi giştî hewl dide wêneyekî giştî yê **wêjeya kurdî ya nûjen**, rê û rêbazên berxwedana çandî û estetîkî û rengên cuda yên vê berxwedanê raxîne ber çavan. Ji ber vê yekê jî, armanca vê nivîsê ew e ku navên sereke yên wêjeya kurdî ji dawiya sedsala 19an heya çarîka pêşî ya sedsala 21ê û berhem û tevgerên wêjeyî bi giştî û kronolojîk vebêje. Herwiha di vê xebatê de yek ji armancan jî naskirin û rêvekirina ji bo lêkolînên berfirehtir e. Bi pirsên giştî avakirina nexşeya wêjeya kurdî û nirxandina tevgerên wêjeyî bi awayekî kronolojîk rê li ber şopandina bîra kolektîf a rewşenbîriya kurdî jî vedike. Ji ber ku herçiqasî di roja me de kêmbê jî, di dîrokê de karên rewşenbîrî, siyasî û wêjeyî her li kêleka hev meşiyane. Heya gelek caran siyasîmedar û nivîskarên wêjeyê heman kes in. Ji ber vê yekê, nivîs wê bi giştî hem behsa serdemên sereke yên wêjeya kurdî hem jî bi awayekî paralelî behsa pêşveçûna rewşenbîriya kurdî bike. Di dawiyê de jî wê hinek tevger, kovar û navan jî derxîne pêş. Di serî de pêşveçûna wêjeya kurdî ya nûjen û gavên pêşîn ên di serdema dereng a Osmanî de tên nirxandin. Di pey re jî serdemên sirgûnî û diyasporayê, modernîzasyonê ziman û wêjeya kurdî li Şamê, Rewanê û Ewropayê, bi taybetî jî li Stockholmê wê werin nirxandin. Di dawiyê de jî tevgerên wêjeyî yên li Stenbolê û rengvedanên nû yên wêjeya kurdî wê bînin analîzkirin.

Ev gotar bi giştî hewl dide wêneyekî giştî yê wêjeya kurdî ya nûjen, rê û rêbazên berxwedana çandî û estetîkî û rengên cuda yên vê berxwedanê raxîne ber çavan.

## 2. Pêşveçûnên wêjeya kurdî û gavên modernîzasyonê di serdema dereng a Osmanî de

Geşedana wêjeyî ya kurdî li Kurdistanê bi piranî ji estetîkî zêdetir bal ji siyasî û pêşveçûnên civakî wergirtiye. Wek mînak, ramana nûjenbûnê, ku di wêjeya kurdî de di dehsalên dawîn ên Împaratoriya Osmanî de dest pê dike, li gel tevgera siyasî, di kovar û rojnameyên bi bingeha siyasî de bi pêş dikevin û jî hêla aktorên siyasî ve tên afirandin. Têkoşîna di navbera berxwedan û netewe-avakirinê de di vê serdemê de gelekî berbiçav e. Pêkanîna pexşanê ji xwe heye û di nav liv û lebatekê de ye. Wek nimûne çend berhemên dînî û rêzimanî wek pexşanê ji sedsala 17an ve hene. Elî Teremaxî *Tesrîfa Kurmancî*, Mewlana Xalidê Neqşibendî *Şarezûrî Eqîdeya Kurd*, Mele Yûnisê Helqetînî jî *Terkîb û Zirûf* nivîsandine. Huseyn Qazî di sedsala 18an de *Mewlûdname*, Melayê Erwasî jî *Tîba Melayê Erwasî* nivîsiye. Di sedsala 19an de mîsyoner û oryantalistên ji welatên Ewropa jî dikevin nav qada pexşana kurdî. Wek mînak cara pêşîn *Peymana Nû* di sala 1872an de tê wergerandin. Gelek *Încîlên* din jî wê dişopînin (Arslan 2014, 136-141). Berhemên berhevkarîya wêjeya devkî, ku ji hêla Peter Lersch, Oscar Mann, Eugen Pryme û Albert Socin ve hatine kirin jî ji bo pexşana kurdî nimûneyên balkêş in. Lê wek xebatên şayandar, em dikarin behsa yên Mela Mehmûdê Bayezidî (1797-1858) *Adat û Rusûmatnameya Ekradiye; Tewarîxê Qedîmî Kurdistan û Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* bikin. (Adak 2013, 306-7). Herçendî pexşanên wî nebin jî Hacî Qadirê Koyî di modernîzekirina helbest û hişmendîya kurdan de yek ji mînakên herî berbiçav e. Hacî Qadirê Koyî, avakarê helbesta kurdî ya modern, bandoreke mezin li qonaxa Stenbolê û fikra kurdayetiyê ya wê serdemê kiriye. Di serî de Xelîl Xeyalî rewşenbîrên kurd ên li Stenbolê dixwestin hîn di sala 1919an de *Dîwana Koyî* çap bikin. Berî vê jî ji xwe Xelîl Xeyalî gelek helbestên Koyî di kovara *Rojî Kurd û Hetawî Kurd* de weşandibûn. Pêkan e ku *Dîwana Koyî* ya destxet li cem wî hebe

(Arslan 2016a, 94, 95). Dîsa Abdullah Cevdet di sala 1913an de gava behsa dewlemendiya wêjeya kurdî dike Koyî jî wek nimûne nîşan dide (Arslan 2016a, 96). Lê ev her çiqasî çend mînakên pexşanî yan helbestî bin jî di kurdî de, ji bo belavkirina zanîne û çîrokbêjiya bi kurdî di dawiya serdema Împaratoriya Osmanî de, divê xwendevan li benda kovar û rojnameyan bisekinin. Rojnameyên *Kurdistan* (1898-1902), *Kürt Teavun ve Teraki Gazetesi* (1908), *Kurdistan* (1909), *Kurdistan* (1917-1918), *Têgeyiştinî Rastî* (1918) û *Jîn* (1919). Kovar jî *Rojî Kurd* (1913), *Hetawî Kurd* (1913), *Bangî Kurd* (1914), *Jîn* (1918-1919) û *Kurdistan* (1919). Lê tevahiya van weşanan bi awayekî lezgînî piştî demeke kurt a weşanê tên qedexekirin û hin jimarên van kovaran hîn jî nayên bidestxistin. Tevî ku di vê serdemê de ti rêxistin û piştgirî nebûne, "wan (rewşenbîrên Kurd) daxwaza vejîna civakî û neteweyî radigihand" (Alan 2016a, 90). Di vî warî de, Celadet û Kamiran, du birayên avakarê ekola Hawarê ne, ku dema li Stenbolê bûn jî di kovar û rojnameyên kurdî û Osmanî de li ser kurdan gelek nivîs dinivîsîn (Arslan 2016, 453-455). Dîsa bi bandor û pêşengiya wan di rojnameyên Osmanî de li ser ziman, wêje û rewşa aktuel a kurdan gelek nûçe hatine weşandin (Arslan 2016, 456-459).

**Celadet û Kamiran, du birayên avakarê ekola Hawarê ne, ku dema li Stenbolê bûn jî di kovar û rojnameyên kurdî û Osmanî de li ser kurdan gelek nivîs dinivîsîn.**

Di van weşanan de, li gel ramana nûjenkirina civaka Kurd, ku xwe dispêre bîrdoziya pozîtîvîst û pragmatîst a di bin bandora rewşenbîrên tirk û ermen de, bi gotina Jusdanis (1991), hesteke derengmayîn a berbiçav heye. Bi taybetî, xwendevan gelek çarçûm dikarin bibin şahidê dayîna ber hev a civaka kurd û civakên din ên bi kurdan re dijîn. Wek mînak, rewşenbîrê kurd ê navdar Abdullah Cevdet di gotereke xwe de, ku di *Rojî Kurd* de hatiye weşandin, wiha dibêje:

*Welatîyên me yên kurd û welatîyên me yên ermenî li rexê hev dijîn. Di gundên ermeniyên me de Hamlet, Makbet, Jul Sezar, Kral Lîr a Şekspîr tê xwendin. Ermenî berhemên Alfiyeri, Dante, Monteskyo û Darwîn dixwînin ku ew berhem ji roja me pêncî sal berê -erê pêncî sal berê- li bajarê Venedîkê, li xwendegehên "Mekîtarîst"an (Mechitaristen) ji bo zimanê ermenî hatibûn tercûmekirin û li heman saziya matbaaya mezin a ermeniyên hatibûn çapkirin. (Cevdet 2013, 140.)*

Abdullah Cevdetê di nivîsa xwe de kurd û ermenan wek du civakên di nav hev de dijîn lê asta rewşenbîrî ku bi xwendina klasîkên edebiyatî yên îngîlîzî û frensî pênase dike, û ermeniyên jî wek civakeke pêşketî yê van berhemên werdigerînin û dixwînin dinirxîne, nebûna van berhemên di kurdî de wek pîrsgirêkê nîşan dide. Herçendî di vir de rasterast neyêne zimên jî, muqayesekirinek û wek encama muqayesekirinê paşvema yîn û derengmayîna kurdan diyar dike.

Li gel vê xwesteka pêşveçûna ilmî ya Abdullah Cevdet, ji ber wê hesta derengmayîne ya ku Jusdanis destnîşan dike, kurd jî di rewşeke panîkî de dikevin nav hewildanan. Wek mînak, Babê Naco dibêje "Zemanê me yê bi xeberdanê derbas bibe tîne ye" (Babê Naco 2017, 166). Her wiha bi helbesta Babê Naco "Xewa xeflet zebandin em/ Ji vê esrê revandin em/ Ji bo cehlê xapandin em/ Ji dinyayê tefandin em/ Di bin zulmê de civandin em/ Ji xew em tîr nebûn ya Reb" (Babê Naco 2017, 166) vê hesta derengmayîne berbiçav dikin. Lê ji pêşveçûnê hîn jî pêşveçûnên teknîkî û pragmatîk tîr fêmkirin ku ev yek jî zêdetir ji hişmendiya Osmanîyan ya îslamî-osmanî pêk tê. Remezan Alan wiha destnîşan dike: Ji ber ku [derengmayîna] kurdan li ser van civakên derengmayî re

**Berhem xwedî ramanên wisa ye ku piştgiriya zimanê nivîskî, yekîtî û desthilatdariya kurdan dike, bi vê taybetmendiya xwe xîtabî hestên rewşenbîrên wê serdemê dike.**

(tirk, faris û piştire jî ereb) pêk hatiye, mirov bibêje ya kurdan "du caran dereng maye" wê ne şaş be û mîna wan a kurdan jî xwediyê karakterekî posîtivist e. Lewra di gotarên rojname û kovarên Mezkur de gelek caran pesnê zanist û teknîkeke serdemî dihat kirin û her car jî balkêşiyek çêdibû, ku dema ev zanist û teknîka pêşketî were wergirtin lazim e mirov ji dîn û diyanetê, ji irf û adetên xwe nebe (Alan 2019, 27)!

Her wiha li gel tirsê derengmayînê, daxwaza ji bo xweseriya çandî û nasnameyê yekta ya li Împaratoriya Osmanî di weşanan de heye. Ji bilî van mijaran, pirsgerêkên siyasî û çandî yê civaka kurd, bipêşxistina perwerdehiya kurdî, perwerdekirina li bajarên kurdan, guhertina alfabe, berhevkirina edebiyata devkî û nûjenkirina zimanê nivîskî mijarên giring bûn. Di belgeyên vê serdemê de, wek amûreke azadiyê (bi taybetî di kovarên serdema piştî şer de) du metafor hene: Qelem û Şûr. (Hassanpour 1993, 35-54; Alan 2016b, 26; Aydinkaya 2021). Di vê metaforê de, ku helbestvanên klasîk Ehmedê Xanî û Hacî Qadirê Koyî arîşe kirine, qelem (pênûs) bê guman wêje, ziman û zanistê simbolîze dike, şûr jî hêz, dewlet û hikumdariyê temsîl dike. Helbestvan ji ber nebûna van tiştan gazindan dikin. Ji bilî van metaforan, du metaforên din jî xuya dibin: "xewkirin" û "hişyarbûn". Ev her du metafor di riya nûjenkirina kurdan de jî cihekî giring digirin; ger yek di xew de be, wê demê divê rojekê ji xew şiyar bibe. Ji ber vê yekê, peywira rewşenbîrên kurd ew e: divê bi awayekî lezgîn civakê şiyar bikin, ji ber ku êdî karwanê pêşketin û azadiyê bi rê ketiye (Alan 2016b; Yekdeş 2014, 332-333). Ev nediyarî û derengmayîn, rewşenbîrên kurd dixê rewşeke patolojîk.

*Mem û Zîn* hema hema di hemû kovar û rojnameyan de parçe parçe hatiye weşandin. Ew metnekî wisa ye ku xwediyên her rojname yan kovaran xwe bi çapkirina wê şanaz hest dikirin. Gelek caran tê gotin, ku wê tevahiya vê destanê di kovar an rojnameyan de bê weşandin lê ji ber temenê van weşanan kurt bûye ev yek pêk nehatiye. Lê wek pirtûk *Mem û Zîn* di 1919an de tê weşandin. Tevî ku ji nivîsîna wê heta weşana wê ya pêşî 224 sal derbas bûne jî *Mem û Zîn* gelekî berbiçav e. Îbrahîm Seydo Aydoğan ji bo vê rewşê, du sedeman dest nîşan dike:

*Sedema yekem ew e ku Mem û Zîn berhemeke sereke ya wêjeya kurdî ye û cihê derbirîna pêşîn û bi zelalî ya fikrên neteweperwerên kurd e. Sedema duyem jî ew e ku tevî nebûna teugereke wêjeyî, Mem û Zîn yek ji berhemên kêmjimar ên bi kurdî bû. Dibe ku her du sedem jî bi hev re bin* (Aydoğan 2014, 76).

Sedema vê giringiya *Mem û Zînê* têkildarî atmosfera siyasî ya wê serdemê ye. Ji ber ku berhem xwedî ramanên wisa ye ku piştgiriya zimanê nivîskî, yekîtî û desthilatdariya kurdan dike, bi vê taybetmendiya xwe bangî hestên rewşenbîrên wê serdemê dike. Ji ber ku Hemzayê Muksî, yê pêşgotin ji bo çapa yekem nivîsiye, ji bo *Mem û Zînê* wiha dibêje, "Milletekî xwedî edebiyat çî qeder bikevit, serayê seltanata wî yê madî beheriuit, dîsa bi himetekê tête tamîrkirin" (Bozarslan 1987, 824) û wê wek bingeha nasname û desthilatdariya kurdan nîşan dide. *Mem û Zîn* tê weşandin û di kovara *Jînê* de berhemên pêşîn ên wêjeya kurdî ya modern tîne weşandin. Di vê serdemê de ku zimanê pexşanî derketiye holê, bi damezirandina netewe-dewleta Komara Tirkîyê re nasnameya kurdî hatiye înkarkirin û di vê serdemê de ev weşan û



xebat dikevin rewşeke bêdeng. Ev kevneşopiya wêjeyî ku bi piranî li Stenbolê hatiye avakirin, koçî welat û herêmên din kiriye.

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, bi avabûna netewe-dewletên nû re, li qadên cuda yên derveyî Kurdistanê û li ser bingehên cuda, bi têkiliyeke pir qels di nav wan de, wêjeya kurdî bi pêş ket. Edebiyata kurdî li Kafkasyayê, nemaze li Rewan û Tîblîsê, li Rojhilata Navîn, bi taybetî li Şam, Bêrûd û Bexdayê (Aydoğan 2014, 106) û paşê di salên 1980yî de li hin navendên ewropî mîna Stockholm, Parîs, Berlîn, Bruksel û herî dawî di salên 1990î de li Stenbolê bipêş ket. Lê heta salên 2000î ti wêjeyeke kurdî ya xwecihî di nav sînorên Kurdistanê Bakur de bi pêş neketiye.

### 3. Wêjeya kurdî li sirgûnê: mînaka ekola Hawarê

Piştî damezirandina Komara Tirkîyê ya di sala 1923an de û piştî tepe-serkirina serhildanên kurdan, ku di vê serdemê de gelek kurd neçar man koç bikin, "berhemên edebiyata kurdî (ya nûjen) ji şanoyek (*Memê Alan*), kurteçîrokek (*Çîrok*), romanek (*Le Xewma*) û çend helbestan pêk dihat. Mirov dikare wek berhevokeke ji helbestvanên navdar ên vê serdemê E. Rehmî Hekarî û Pîremêrd bihesibîne. Lewra ev çîrok jî nehatine bidawîkirin. Wergêrên têkiliyên bi çandên din re nîşan bidin, hema hema tine ne." (Alan 2014; 90-1). Di vê rewşa dijwar de, bi derketina kovara Hawarê re di 15ê Gulana 1932an de, li Şamê di dîroka wêjeya kurdî de serdemeke nû dest pê dike. Di roja me de kurd her sal vê rojê wek cejna zimanê kurdî pîroz dikin (Tejel 2020; Zeraq 2018; Onen 2018). Yek ji kevneşopiyên wêjeyî yên herî bi bandor, ku hîn jî ji bo wêjeya kurdî ya hevçerx bingeh û çavkaniyeke giring e, latînîkirina alfabeyê, sazkirina pergaleke rêzimanî ya nû, nivîsîna gotarên wêjeyî yên dîrokî û rexneyî, giringîdayîna zêde ya ser kurteçîrokê û wergeran tev di pêşketina wêjeya kurdî ya hevçerx de gavên giring bûn. Ekola Hawarê ji van kovaran pêk tê: *Hawar*, *Ronahî*, *Roja Nû û Stêr*. Celadet Elî Bedirxan û Kamiran Elî Bedirxan di vê êkolê de kesayetên sereke bûn. Her wiha nivîskarên ciwan mîna Cegerxwîn, Qedrîcan, Osman Sebrî û Nuredîn Zaza nivîskarên giring in.

Bi riya lêkolîneke gotarî (discourse), temsîla bîra kolektîf û berxwedana neteweyî û çandî bi pêş dikeve. Koçberî, jiyan û nasnameya sirgûnê, dagirkerî û kolonîkirina Kurdistanê, nezanî, xizanî, dîrok û kevneşopiyên kurdan mijarên sereke yên van kovaran bûn. Ji ber mirina zû ya Celadet Elî Bedirxan di sala 1951ê de ku edîtorê Hawarê bû û ji ber damezirandina Komara Suriyê ya Ereb, xwendegeha Hawarê bi dawî bû. Kamiran Elî Bedirxan diçe Parîsê û heta dawiya jiyana xwe li Zanîngeha Sorbonê xebatên xwe yên li ser wêje û zimanê kurdî berdewam dike (Tejel 2020; Zeraq 2018). Wek Clémence Scalbert Yucel jî destnîşan dike, rewşenbîrên kurd ên li sirgûnê yên li Şamê polîtîkayên ziman û çandê bi pêş dixistin:

*Alfabeya kurdî hat latînîkirin, rêziman hat nivîsîn, û ferheng hat xwerûkirin. Di heman demê de zimanê kurdî wek bingeha nasnameya kurdî ya neteweyî hat avakirin: ziman ji bo cudakirina gelê kurd ji gelên cîran wek nîşaneya herî bihêz dihat dîtin. Lêbelê, teugera neteweyî ji bo karibe zimanekî qedexekirî belav bike ne ewqasî bihêz bû. (Yucel 2020, 173)*

**Koçberî, jiyan  
û nasnameya  
sirgûnê,  
dagirkerî û  
kolonîkirina  
Kurdistanê,  
nezanî,  
xizanî, dîrok û  
kevneşopiyên  
kurdan  
mijarên sereke  
yên van  
kovaran bûn.**

#### 4. Wêjeya kurdî-Êzîdî li Yekîtiya Sovyeta berê

Di şertên Şerê Cîhanê yê Yekem de, bi taybetî di sala 1915an de fermana li serê Ermenî û Suryaniyan hat rakirin li êzîdîyan jî hat kirin. Kafkasya, bi taybetî jî Ermenistan ji êzîdîyên ji fermanê filitîn re bû star. Ev Kurdên êzîdî yên ji ber bayê fermanê filitîn, di heman salên ekola Hawarê hatibû avakirin de dest bi kevneşopiyeye wêjeyî kirin. Wêjeya kurdî ya Kafkasyayê herî kêr 40 salên pêşîn wek "giravekê" tê xuyakirin. Di bin zagonên Yekîtiya Sovyetê de, ji ber sînorên bi tundî kontrolkirî, aloziyên jeopolîtîk û sansura bîrdozî demeke dirêj pêwendî bi Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê re tine bû. Di sala 1932an de komeke nivîskarên Kurd ji Rewanê cîldeke Rya Teze û çend pirtûk ji bo rewşenbîr û nivîskarê kurd Celadet Elî Bedirxan şandin Şamê. Di sala 1937an de, ji ber vê têkiliya rewşenbîran, Heciyê Cindî, Cerdoyê Genco û Ehmedê Mîrazî ketin girtîgehê û Erebe Şemo heta dawiya desthilatdariya Stalîn li Sîbîryayê sirgûnê ma. (Eşo 2016, 53)

Di sala 1932an de komeke nivîskarên kurd ji Êrîvanê cîldeke Rya Teze û çend pirtûk ji bo rewşenbîr û nivîskarê kurd Celadet Elî Bedirxan şandin Şamê.

Li Ermenistanê di serdema Sovyetê de bi sedan pirtûk hatin nivîsîn lê îro ji bo xwendevanên Bakurî ji sedî hindiktir berdest in. Ji ber zanîna netekûz û kêmasiya daneyan, hemû xebatên zanistî kêr in. Dibe ku ji ber vê kêmasiyê piraniya zanyarên wêjeya kurdî li gotinên xwe miqate ne. Her wiha xaleke din a eşkere ew e ku hema hema hemû berhem li Rewanê hatine çapkirin û piraniya nivîskaran li Rewanê dijîyan. Ermenistanê hema bêje yekane komara Sovyetê bû ku berevajî Gurcistan, Azerbaycan û Tirkmenistanê ku kurd bi girseyî li wan welatan jî dijîyan, piştgiyariya kurdan dikir. Îsmet Şerîf Vanlî wiha dibêje:

*Ermenistanê piştî zordariyên serdema Stalîn binesaziyên çandî yên kurdan parast. Rewşenbîrên Kurd bi piranî ji Ermenistanê ne û bi piranî ji ber wê yekê ye kurdên Ermenistanê di asta seretayî û navîn de ji bilî dersên zanistî dikaribûn bi zimanê xwe perwerde bibin. Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê xwedî beşa kurdî bû û di Instituta Rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistan a Ermenistanê de beşeke pêşketî ya Xebatên Kurdî bi desteya zankoya ermenî-kurdî ya heupar hebû. Gelek pirtûk, tevî pirtûkên dersê, berhemên wêjeyî û zanistî û her wiha wergerên nivîskarên biyanî jî hene û bi kurdî tî çapkirin. Kurd di Komîteya Navendî ya Partiya Komunîst a Ermenî de, di meclîs û hikûmetê de ji aliyê siyasî ve tî temsîlkirin û radyoya Ermenistanê nûçe, muzîk, û bernameyên din bi kurdî diweşîne (Veguhestin Ghobadi 2015, 14).*

Ev rastî bi dîroka ermeniyan re me digihîne xwendineke paralel a dîroka kurdên Kafkasyayê. Herwiha wjeya kurdî bi geşedanên dîrokî yên ermenî ve bi awayekî bi hêz girêdayî ye. Nemaze romanên Erebe Şemo, Seîdê Îbo û Heciyê Cindî dikarin wek pirtûkên dîroknûsiya sedsala 20an a Ermenistanê bî xwendin. Û qebûlkirina wan wek kurdên ji Ermenistanê yên ku li wir ji dayik bûne û xwedî bîreweriyeye heta hetayê ya Ermenistanê ne, wê perspektîfeke vekirî û berfireh a lêkolîna vê wêjeyê bi xwe re bîne. Her wiha wek Christine Allison diyar dike: "Ji ber ku bîrdoziya fermî ya Sovyetê piştgirî da pêşveçûna neteweyên biçûk, bi armanca vehewandina cudahiyan neteweyî yên di civaka mezin a sosyalîst de, nivîskarên kurmancî-axêv, weşanger û rewşenbîrên kurd ên li Ermenistanê bi piştgiyariya fermî ya ermenan û bi ihtimaleke mezin ji binyadên siyasî yên Yekîtiya Sovyetê tevdigerin" (Allison 2013, 193). Bi taybetî di bîst salên pêşîn ên Yekîtiya Sovyetê

de jimareke zêde ya nivîskarên ermenî hebû ku bi kurdî dinivîsandin û piştî ev piştîgirî bi gelek wergerên wêjeyê yên du-alî berdewam kir. Nivîskarên bi eslê xwe ermenî yên herî kêr pirtûkeke kurdî çap kirine, ev in: Hagob Xazaryan (Lazo), Hraciya Koçar, Hovhannes Şîraz, Xaçik Daştêns, N. Zariyan, Sarmên, S. Koçariyan, Vêspêr, V. Girigoryan, S. Taronsi, L. Miricaniyan, S. Harûtûniyan, M. Xêraniyan, V. Karêns, S. Soxêns, and V. Norêns (Eşo 2016; 44). Her wiha xebatên akademîk û rexneyî yên giring ên li ser têkiliyên kurd-ermenan di wêjeya bi zimanê ermenî de hene. (Eşo 2016, 44-48). Di warê sazîbûn û weşanê de, ji nivîskar û weşangerên ermenî piştîgiriyeke berbiçav heye, ku tevî li Gurcistan an Azeybaycanê gelheyeke kurdan a mezin hebû ev yek li van welatan nîn e. Bîra kolektîf a ermenî û kurdên êzîdî û dîroka hevpar a bobelatên di 1915an de bê guman bandor li vê encamê kiriye.

**Dîroka wêjeya kurdî, li Ermenistanê, wek wêjeya neteweyeke biçûk, ku ne xwedî herêmên xweser in, bi awayekî bingehîn piştî geşedanên siyasî yên mezin ên li Yekîtiya Sovyetê diguhere.**

Dîroka wêjeya kurdî, li Ermenistanê, wek wêjeya neteweyeke biçûk, ku ne xwedî herêmên xweser in, bi awayekî bingehîn piştî geşedanên siyasî yên mezin ên li Yekîtiya Sovyetê diguhere. Tesnîfkirina dîroka wêjeyî ya di navbera serdeman de li gel van guherînên siyasî roleke giring wergirtiye. Li gel giringiya tesnîfa du-serdemî ya Emerîkê Serdar ku ji destpêkê (1922) heta salên 1960î wek serdema sosyalîst bi nav dike. Dewra duyem ji salên 1960î dest pê dike û heta dawiya Yekîtiya Sovyetê (1991) didome. Ew her wiha vê serdemê wek serdema wêjeya neteweyî bi nav dike. (Estelle Amy de la Bréteque 2017, 105). Dabeşkirina sê-serdemî ya Tosinê Reşîd jî rojên giring ên siyasî dişopîne. Serdema yekem ji damezirandina Yekîtiya Sovyetê (1922) heta sala 1937an didome. Serdema duyem salên 1937-1955 dihewîne. Serdema sêyem û dawîn jî piştî mirina Stalin, di sala 1955an de dest pê dike û heta hilweşîna Yekîtiya Sovyetê (1991) didome. (Tosinê Reşîd 2012, 202-212).

Ez li gel van her du dabeşkirinan pênc serdemên cuda yên giring pêşniyar dikim. Ev serdem hewildanên wêjeya kurdî yên li Ermenistanê zelaltir dikin.

**Serdema yekem** bi damezirandina Yekîtiya Sovyetê dest pê dike û bi weşandina rojnemaya *Rya Teze* bi dawî dibe. Amedekirina materyalên perwerdehiyê û damezirandina alfabeya latînî ji bo kurdî di sala 1928an de pêşketinên vê serdemê yên giring in.

**Serdema duyem** bi weşandina *Rya Teze* dest pê dike, ku di sala 1930î de ji aliyê hin nivîskarên ermenî û kurd ve wek kovara fermî ya Partiya Komunîst hatiye weşandin. (Eşo 2016, 40). *Rya Teze* dibe yek ji naven-dên sereke yên rewşenbîrên kurd anîne cem hev; tevî ji çar rûpelan sê rûpel ji bo belavkirina bîrdoziya dewletê hatibûn veqetandin. Wek Emerîkê Serdar dibêje: "*Ger rojnameya Rya Teze nebûya wê wêjeya kurdî li Ermenistanê tine bûya.*" (Sardar 2017, 107). Ji ber ku hivdeh kesan roj-nameya çar-rûpelî derdixistin, vê koma xebatê ji dewletê piştîgiriya aborî distend. Bi gelemperî kesên wêje bi pêş xistibûn xebatkarên vê rojnameyê bûn. Bi giştî, di 8 salan de 148 pirtûk hatin çapkirin (Sardar 2017, 9). Kurd di hin çavkaniyan de ji vê serdemê re dibêjin, "Edebiyata Sêwiyan". Ji ber ku piraniya nivîskarên vê serdemê bûne şahidê komkujîya 1915an, ku di vê komkujîyê de malbatên xwe winda kirin û li sêwîxaneyan mezin bûn.

Di navbera salên 1965 û 1980î de tenê 15 pirtûk hatine çapkirin. Lê ji ber qedexeyên li Bakur yek ji wan jî nehat belavkirin.

**Serdema sêyem** bi rejîma totalîter a Stalîn re, li derdora 1937an dest pê dike û nêzî bîst salan berdewam dike. Ji bilî şanoya kurdî ya li gundên kurdan, ku ji bo propagandaya dewletê hebû, nivîsandina bi kurdî qedexe bû. Serdema rawestîn an jî bêdengiyê ji bo vê serdemê dikare bibe îfedeyeke bikêrhatî.

**Serdema çarem** bi mirina Stalîn dest pê dike û heta dawiya Yekîtiya Sovyetê didome. Mirov dikare ji vê serdemê re bibêje serdema pêşketin û azadiya vegotinê. Kurdan di hemû warên edebiyatî û rewşenbîrî de, sînorên Ermenistan û Yekîtiya Sovyetê derbas kirin.

**Serdema pêncem** û dawîn a wêjeya kurdî bi parçebûna Yekîtiya Sovyetê dest pê dike. Ev serdem dikare wek Pelişîn (Dissociation) an jî wek Serdema Piştî-Sovyetê were binavkirin. Piraniya endamên vê serdemê ji ber sedemên siyasî û aborî neçar man ji welatê xwe derkevin. Di heman demê de, piştgiriya dewletê ya ji wêjeya kurdî re li Ermenistana nûjen bi dawî bû. Ger ez bi kurtî çend endamên giring ên vê serdemê bidim nasandin, wê rewş zelaltir bibe. Eskerê Boyik li Oldenburgê diji û wek nivîskarê romanê û dîroknas tê zanîn. Tosinê Reşîd li Sydneyê diji û wek nivîskarê romanê û rexnegir tê zanîn. Tîmûrê Xelîl li Stockholmê diji û wek nivîskarê kurteçîrokan tê zanîn. Ezîzê Gerdenzerî li Kopenhagê diji û wek nivîskarê romanê tê nasîn. Emerîkê Serdar di sala 2018an de li Osloyê koça dawî kir û wek nivîskarê kurteçîrokan û rexnegir tê nasîn. Wezîrê Eşo di sala 2016an de li Brukselê koça dawî kir û wek nivîskarê roman û çîrokan û rexnegir tê nasîn. Prof. Celîlê Celîl jî li Viyanayê diji û wek dîroknas, akademîsyen û folklornas tê nasîn.

## 5. Diyaspora: Destpêkeke nû di wêjeya kurdî de

Diyasporaya Kurdan di salên 1970yî de li Ewropayê gavên pêşîn diavêjê. Li Iraqê piştî rûxîna serhildana Mele Mistefa Barzanî, şerê Îran-Iraqê yê di navbera 1980-1988an de û komkujiyên Helepçe û Enfalê çêdibin. Li Tirkiyê rewşa aloz a piştî darbeyên leşkerî yên 1971 û 1980yî, li Îranê di sala 1979an de ji ber guhertina rejîmê û hatina şiyandariyê kevnepereşt û li Yekîtiya Sovyetê hilweşîna rejîma komûnîst a di 1991ê de berê kurdan dide derveyî welêt û Ewropa ji nişka ve ji bo rewşenbîrên kurd dibe sîwanek (Galip 2015). Ger ez mînakekê bidim, di navbera salên 1965 û 1980yî de tenê 15 pirtûk hatine çapkirin. Lê ji ber qedexeyên li Bakur yek ji wan jî nehat belavkirin. Hin ji wan pirtûkan, pirtûkên olî bûn. Şanoya Mûsa Anter *Birîna Reş*, berhevoka kurteçîrokan *Meyro*, çapkirina ji nû ve ya romana Erebê Şemo Şivanê Kurda, kovara edebiyatî *Tirêj* (tenê 3 jimar), pirtûkên wêjeyî yên sereke yên vê serdemê bûn (Malmisanij 2006, 45-47). Di nivê duyem ê sedsala bîstan de, kurdên ji her parçeyên Kurdistanê wek penaber li Ewropayê hatin cem hev û di destpêka salên 1980yî de li gel xebatên siyasî giringiyeke zêde dane lêkolînên zimanî û edebiyatî. Rewşenbîrên kurd ên çûne wir, di warê hilberandina wêjeyî de, bi xêra têkiliyên nav kurdan û têkiliya nav-çandî û bi lêkolînên zimên, li diyasporayê pêşketinên cidî nîşan didin. Ev mekanên diyasporayê bûne yekane cihên kurdî û wêjeya kurdî yên tê de raman û hêviyên xwe vegotine.

Rewşenbîrên li dora kovar û weşanxaneyên wêjeyî bûne yek, mîrateke cidî ji edebiyata îro re hiştine. Swêd, bi taybetî Stockholm, her tim

**Rewşenbîrên li dora kovar û weşanxaneyên wêjeyî bûne yek, mîrateke cidî ji wêjeya îro re hiştine.**

navenda sereke ya van xebatan bû. Lê her kesî li wir dest bi nivîsîna metnên wêjeyî nekiriye. Wek mînak, Mehmed Êzûn û Mahmûd Baksî li welatê xwe di warê siyaset û rojnamegeriyê de çalak bûn. Her wiha hin kesayet hebûn, mîna Rojen Barnas, Mehmet Emîn Bozarlan û Cegerxwîn, beriya koçî Ewropayê bikin, hin berhemên giring ên edebiyatî çap kiribûn (Yücel 2012, 553). Van nivîskaran çalakiya siyasî û edebiyatî têkilhev dikirin. Wek Clemence Schalbert Yücel dibêje: *Divê bê dîtîna ku dîtîna cudahiya di navbera nivîskar û milîtan de diwar e. Di rastiyê de, milîtanên siyasî yên li Swêdê dijîyan, bi şêwazeke nû milîtanî pêk anîn. Ji bo piraniya wan, çalakiyên siyasî yên li derveyî welêt (Kurdistan) bê wate ne. Em dibînin ku veguherîneke çalakiyên siyasî ji bo çalakiyên çandî pêk tê. Lê çand, wek adaptasyoneke helwesteke siyasî tê dîzaynkirin. (...) Ev milîtaniya nû ya çandî ya bihêz a li Swêdê, ji aliyê siyaseta Swêdê ve jî tê piştgirîkirin.* (Yücel 2012; 553).

Di vê kevneşopiya wêjeyî ya li Swêdê, ya di navbera salên 1965 û 2005an de, nêzî 50 nivîskarên kurd hene, ku piraniya wan ji Kurdistanê Bakur hatine. Ji 818 pirtûkên kurdî yên çapkirî, 420 pirtûk bi zaravayê Kurmancî ne. Her wiha ji 140 kovar û rojnameyan 82 bi tevahî bi kurdî ne. Ji van kovaran, 39 kovar du-zimanî ne û 19 kovar bi zimanekî din hatine weşandin, lê ew ji aliyê kurdan ve hatine weşandin û bi giranî li ser mijarên têkildarî kurdan in. Agahiyeke din a balkêş jî ev e ku heta sala 2005an li Swêdê bi giştî 45 weşanxaneyên kurdî hatine damezirandin (Alakom 2006, 191-200). Hemû ev agahî eşkere dikin bê çawa Swêd di salên 1980yî de bû navendeke ji bo diyasporaya kurdî û bû pêngavek ji bo nasname û ziman û di heman demê de bû qada afirandinên wêjeyî û zimanî yên kurdî (Yücel 2012, 552).

Li gel jimara zêde ya berhemên peşanî yên kovar û rojnameyan jimareke zêde ya pirtûkan jî tê çapkirin. Weşandina jimareke pir a pirtûkên kurdî yên cureyên cuda di vê serdemê de pêk tê. Herwiha wergerandina nivîsên giring ên wêjeya rojavayî yên mîna Dostoyevski, Victor Hugo, Albert Camus, Heinrich Böll, Jack London, John Steinbeck, Yaşar Kemal û berhemên swêdî (bêguman di vê dewra wergerandinê de para herî mezin a berhemên swêdî ye) jî di vê serdemê de pêk tên. Romanên bi destê nivîskarên kurdên Kafkasyayê hatine nivîsîn û di navbera salên 1935 û 1990î de bi elfabeya kirîlî hatine çapkirin, çapên duyem bi alfabeke latînî li Stockholmê derdikevin û belkî cara pêşîn digihîne ber destên kurdên ji parçeyên Kurdistanê yên din. Di encama van weşanên ji dawiya salên 1970an ve destpêkirine, pêleke nivîskarên roman û çîrokan di wêjeya kurdî de dest pê dike û gelek nivîskarên hêja derdikevin: Mehmed Uzun, Mahmûd Baksî, Bavê Nazê, Firat Cewerî, Mustafa Aydogan, Brîndar çend navên sereke ne.

Ger em bi giştî roman û kurteçîrokên vê dewrê yên li Swêdê binirxînin, eşkere ye ku piraniya wan berhemên dîdaktîk in. Serlehengê wan mamoste, şagirt an şoreşger in û hewl didin civakê di atmosfera berxwedanê de biguherînin. Roman li ser bingeheke realîst ava dibin û taybetmendiyên wan ên otobiyografîk berbiçav in. Û di serdemê yekem a romanên (kurteçîrok jî) kurdî de, leheng her dem xwe di nav şerekî li dijî "yê-din" yê ne-Kurd de dibînin, lê di hin romanên paştir de, serleheng bi hin hêzên herêmî yên kurd re rû bi rû dibin ku ev hêz li dijî îdealên wan radiwestin. (Ahmadzadeh 2015, 237). Digel

**Sedema nivîsînê ya sereke ya bi kurdî ew bû ku zimanê xwe ji mirinê biparêzin. Ji ber ku, dema wan li diyasporayê dinivîsî, axavtina bi kurdî li welatê wan qedexe bû.**

ku kurteçîrokên nûjen ên yekem bi ekola Hawarê re ketin edebiyata kurdî, romanên pêşîn li sirgûnê li Ewropayê hatine nivîsîn. Her çend em sînorekî diyar nekin û hemû nivîsan mîna hev û homojen nebînin jî, romana kurdî ya ku hem li Ewropayê heta salên 2000î û hem li Stenbolê ji salên 1990î ve hatiye hilberandin, bi awayekî hewl dide zimanê nivîskî ava bike, şiyaneweriya kurdî îspat bike û bersivê bide serdestan.

Ev vegotinên wêjeyî bi piranî bi van mijaran re mijûl dibin: bobelatên civakî, şer û trawmayên kesanî û civakî yên xwedî paşxaneyêke siyasî ne. Her wiha serhildanên kurdan, darbeyên leşkerî yên li Tirkiyê, jiyana girtîgehê (nemaze li ser girtîgeha Amedê), parçebûna ax û sînorên kurdan çend mijarên din ên giring in. Özlem Belçim Galip, zanyareke romana kurdî ya modern, ku beşeke mezin a teza xwe li ser romanên kurdî yên diyasporayê nivîsiyê, dibêje, romanên diyasporîk ên kurdî ên li Swêdê bi gelemperî li ser her cure serpêhatiyên dramatîk û erênî yên wan li sirgûnê jiyane nasekinin. Bi awayekî hêsantir, di piraniya van romanên de bûyer li herêmeke Kurdistanê pêk tê û pir hindik ji wan balê dikişînin ser serpêhatiyên koçberî û sirgûniyê yên li Ewropayê (Galip 2014, 82-90). Galip di heman gotarê de radigihîne ku nêzî 64 roman li Swêdê hatine nivîsîn û tenê sê ji wan çîrokên jiyana sirgûniyê vedibêjin. *Payîza Dereng* (2005) a Firat Cewerî, *Ronakbîr* (2003) ya Laleş Qaso û *Pêlên Bêrîkirinê* (1999) ya Mustafa Aydoğan. Lê ev her sê roman, di heman demê de jiyana sirgûniyê bi bêrîkirina zaroktî û xortaniya li welatê xwe, her wiha têkoşîna trajîk a li ser siyaset û nasnameyê vedibêjin ku li welatê wan rûdaye. Em di van sê romanên da serlehengên wisa dibînin ku têkiliya wan bi civaka Swêdî re tine ye yan pir kêma û wek biyaniyekî û bi tenê di civakê de dijî. Nîşaneyên biyanîbûn û depresyonê di van romanên de gelekî aşîkar in.

Nivîskarên vê serdemê hîn jî ji dêvla xwesteka afirandina berhemeke estetîkî, pirtir li ser armancên exlaqî û siyasî dinivîsin. Armanca wan a sereke, nîşandana hebûna kurdan, ziman û wêjeya kurdî bû. Sedema sereke ya nivîsîna bi kurdî ew bû ku zimanê xwe ji mirinê biparêzin. Ji ber ku, dema wan li diyasporayê dinivîsî, axavtina bi kurdî li welatê wan qedexe bû. Ev ne ecêb e dema ku em li otobiyografiyên wan dinêrin. Hemû jî di astên cuda de di heman demên cuda de çalakvanên siyasî bûn. Ji bilî nivîsîna romanên, pirtûkên rêziman û yên fêrîkirina zimên jî dinivîsîn. Ew gelekî bi berhevîkirina berhemen folklorîk re mijûl dibin. Dîzaynkirin, standardkirin û parastina zimên armanca wan bû. Edward Said vê helwestê di mînakê gelên bindest de wiha şîrove dike: Trajedyeke ronakbîr, helbestvan û nivîskarên çanda berxwedêr heye, ji ber ku ew mecbûr in wan çandên windabûyî, leheng û mîtosên mîletê xwe rizgar bikin û li ser wan bixebitin (Said 2016, 318-340). Ji ber vê yekê, ew xwe berpîrsiyar dibînin, ku mîrasa çandî rizgar bikin. Ji ber vê yekê Şener Özmen wan wek nifşekî cidî, mîsyoner, bihêz, arşîvîst, berhevkar û avakar dinivîsîne. (Özmen 2015, 93). Ji vî aliyê ve, wê were dîtîn ku romanên kurdî yên diyasporîk, bi awayekî kûr di dîroka rabirdû û bîranînên kesane de cih girtine, dikarin wek têkoşîna li dijî dijberiya di navbera bîr û dîrokê de bînin dîtîn. (Galip 2013, 5).

Li aliyê din, li Ewropayê welatê herî zêde Kurd lê dijîn Almanya ye. Ji

sala 1980yî û vir ve li Elmanyayê berhemên wêjeyî yên kurdî hene lê ji ber ku ev lêkolîn li gelek navendan belav bûne, lêkolîn bi awayekî baş nehatine arşîvkirin û ti lêkolîn li ser wêjeya kurdî ya li Elmanyayê tine ne, îroj zehmet e ku mirov behsa kevneşopiyê wêjeyî ya tevahî bike. Dibe ku xebata yekane ya li ser wêjeya kurdî li Elmanyayê *Die kurdische Exilliterature in Deutschland von den 70er Jahren bis heute* (Edebiyata Kurdî ya Sirgûnê ji Salên 70yan Heya Roja me [1994]) ya Mahmood Hama Tschawish e ku tenê çend rewşenbîrên kurd digire dest.

## 6. Berxwedana wêjeyê: Wêjeya kurdî ya li Stenbolê ya salên 1990î

Di wan salên li Swêdê tevgera wêjeya kurdî ya bihêz hebû, li Bakur ji sala 1991ê û pê de bi guhertina qanûneke li dijî weşana bi zimanên kêmaran li Tirkîyê (zagona 1932, 12.04.1991), kurdî di warê weşangerî û wêjeyê de dikeve nav bazara weşangeriyê (nemaze li Stenbolê). Navendên mîna Instîtuta Kurdî û Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM), kovarên mîna *Rewşen* û *Nûbihar* û rojnameya hefteyî *Welatê Me* mecrayên sereke yên wêjeya kurdî bûn. Piştî, çend kovarên din ên wek *Pelîn*, *Kevan* û *Gulistan* hatin weşandin lê tenê ji bo demeke kurt.

**Çapkirina pirtûkekê bi navê xwe, tiştêkî gelekî xeternak bû. Û bê guman pêwendiya vê neçapkirinê bi derfetên aborî yên çapkirina pirtûkan re jî hebû.**

Yek ji nivîskarên nifşê salên 1990î, Dîlawer Zeraq ê îro wek rexnegir, ferhengnas û romannivîs tê nasîn tevgera wêjeyê ya salên 1990î ya li Stenbolê, ne wek destpêkekê lê wek jinûve-destpêkirineke xwe bi nifşekî wisa pênase dike. Vî nifşî dikarî piştî karesata 12ê Îlonê (1980) car din xwe ave bikira (Ay-Yeşilmen 2016, 116). Di heman demê de, li gor wî, ev serdem "pêngava vejîn û naskirina" nasnameya kurdî ye (Ay-Yeşilmen 2016, 117-8). Endamên vî nifşî bi piranî di kovar û rojnameyan de dinivîsîn. Ji ber zextên siyasî, giring bû ku ew di kovar û rojnameyan de navnediyar bimînin. Çapkirina pirtûkekê ya bi navê xwe tiştêkî gelekî xeternak bû. Û bê guman pêwendiya vê neçapkirinê bi derfetên aborî yên çapkirina pirtûkan re jî hebû.

Li gor Zeraq, nêrîneke hevpar a vî nifşî hebû ku bi dengekî qêrînî û hêrs digot, "Ez heme û li vir im" (Zeraq 2016, 120). Her wiha endamekî din ê vî nifşî, nivîskarê romanê û akademîsyen Îbrahîm Seydo Aydoğan jî dirûşmeke vî nifşî wiha şîrove dike: "Ger ez bimirim, bila hêja be, li ser zimanê wî bû. Te digot qey diçû şer. Belê, rast e jî, ji xwe diçû şer; lewre nivîsandina bi kurdî rengekî berxwedanê bû." (Aydoğan 2016, 10). Vî nifşî bi perspektîfeke dijber giringiyê mezin daye avakirina ziman û wêjeyê. Endamên vî nifşî ne siyasîmedar bûn û ji nav siyasîteke çalak derneketibûn, lê di şerên salên 1990î yên di navbera dewleta tirk û têkoşerên kurdan de mezin bûn. Ev nifşê yekem e ku dikarî serdana welatê xwe bike, lê nikarî pirtûkên xwe li wir çap bike û diviya bi dizî bifirota. Lê bi kêmanî rîyeke vekirî ya têkilî û serdana mirovan hebû û ji ber girêdana kovarê ya bi tevgera siyasî ya kurd re, hêsantir digihîşt destê civakê. Her wiha, wek Zeraq li ser piraniya wan ên li wir dijîn, digot: *Ji sedî 80 ji nivîsarên ji kovar û rojnameyan re dihatin rêkirin û tê de diweşiyên, ji bakur, ji welêt dihatin şandin. Û ev weşan di heman demê de herî zêde li welêt dihat belavkirin û xwendin. Yanî Stenbol, ji bo avabûn û geşedana wêjeya kurdî, bes şûngehek bû, lê bêguman ne bîngehek bû. Stenbol bi dûrîtiya xwe ve, bi biyanîbûna xwe ve û bi nejbûna xwe ve bi rolekê radibû û ciyê kêfxweşiyê ye ku ew rol gelekî bi kêr kurdan û bi taybetî bi kêrî ziman û wêjeya kurdî dihat. Û divê bibêjim ku*

*xebatên li Stenbolê dihatin kirin herî zêde li welêt deng vedida, lê li Stenbolê, hema bibêje qet, nedigihîşt komên xelkê (Zeraq 2016, 122).*

Li ser vê mijarê, Aydogan vê rewşê dipeyîtîne ku "piraniya berhemdarên kour û rojnameyên kurdî yên li Stenbolê para bêtir ji nivîskaran wiha bû ku li welêt dijyan. Bandora endamên wî nifşî yekser û rasterast li ser nifşên pey re çêdibû, lewre peywendiya fizîkî di nava wan û xelkê kurd de hebû" (Aydogan 2016, 9). Ev yek me digihîne têkiliya navbera nifşên wêjeyî yên cuda. Digel ku têkiliya di navbera wan de qels bû, ew her dem li ser hev agahdar bûn. Bi çalakiyên kesianî, mîna Mûsa Anter û Mehmed Emîn Bozarslan, Hawar bandor li ser dema Tîrêjê kir û bi alîkariya Arjen Arî û Berken Bereh, me dikarî qêrîna her kesî bibihîsta, nexwe em dikarin bi awayekî aşîkar bibêjin, ku nifşekî şopdarên nifşê salên 1990î heye" (Ay-Yeşilmen 2016; 124). Her du nivîskar, Îbrahîm Seydo Aydogan û Dîlawer Zeraq, ku nûnerên gelekî giring ên salên 1990î ne, ji xwe pirtûkên xwe çap kiribûn. Lê têkiliya vî nifşî bi nivîskarên li Ewropayê, nemaze yên li Stockholmê re çawa bû? Aydogan nîşan dide ku hema hema ti bandora vî nifşî li ser wan tine bû; ji ber ku wan nikaribûn xwe bigihînin pirtûkên li Stockholmê. Di sala 1995an de, wî cara yekem karîbû romana Mehmed Uzun *Siya Evîne* û pirtûka Celadet Elî Bedirxan, *Rêzimana Kurdî* bi dest bixe. Li gor wî, ev berhem ji bo vî nifşî xwedî roleke wek a paltoyê Gogolî bûn (Aydogan 2016, 15). Wek em dizanin, Belinsky, rexnegirê Rus, qîmetekî ewqasî dide çîroka Gogol a bi navê 'Palto' ku di devereke de dibêje wêjeya rûsî ji paltoyê Gogol derketiye. Ji bo Aydogan jî, *Siya Evîne* ji bo wê serdemê xwedî roleke bi vî rengî ye.

**Yanî Stenbol, ji bo avabûn û geşedana wêjeya kurdî, bes şûngehek bû, lê bêguman ne bingehêk bû.**

<u>Sal</u>	<u>Jimara weşanan</u>	<u>Sal</u>	<u>Jimara weşanan</u>
1923-1970	6	1994	19
1971	1	1995	18
1972-1974	0	1996	24
1975	1	1997	15
1976	2	1998	26
1977	2	1999	32
1978	2	2000	34
1979	2	2001	35
1980-1989	0	2002	69
1990	3	2003	79
1991	18	2004	77
1992	38	Giştî	522
1993	19		

*Tablo 1: Pirtûkên kurdî yên weşandî, di hemû cureyan wêjeyî de, li Tirkîyê, di naubera salên 1923 û 2004an de (Malmîsanij 2007; Yucel 2012 û Mulaşîm 2018).*

Xala herî giring û bibandor a vî nifşî ji nasnameya dekolonîzebûyî ya vegotin û zimanê wan tê ku Aydogan jî destnîşan dike, mirov dikare, "çalakiyên wêjeyî yên nifşê salên 90î wek tevgereke dijkolonyal jî bihesibîne, lewre koloniyên herî mezin di bîr û hiş û mejiyê bindestan de tîn avakirin, ku nivîsandina bi kurdî û vegera li xwe, şikandina qalikê asîmilasyonê û herwiha şikandina mejiyê kolonyalîzmê jî bû. Yê ku bi kurdî nivîsand, êdî azad bû û ew wiha hebû û wiha bextewar bû. Ji ber wê bû ku ew neditirsîya" (Aydogan 2016, 14). Zanyarekî din Hasan Sun ku di warê wêjeya kurdî de wek Hesênê Dewrêş tê nasîn, ev aliyê dekolonyal ê wêjeya kurdî,



Ev kovar deh salan derketine û bi giştî taybetmendiya sereke ya vê serdemê temsîl dikin, em dibînin ku ev kovar paralelî pêşketina siyasî û rewşenbîrî ya kurdan in.

nemaze romana kurdî tîne zimên: "Gelekî eşkere ye ku ji bilî bipêşxistina zimanê niuîskî û peyîvandina kurdî wek zimanekî bikêrhatî, heta salên 2000î jî hewldana bersivandina hêzên kolonyalîst li pêş e" (Sun 2014, 2-3). Dema em li veguherîna naverokî ya kovarên *Rewşen* (1992-1996), *Jiyana Rewşen* (1996-2001) û *Rewşenname* (2003) yê binêrin, ku ev kovar deh salan derketine û bi giştî taybetmendiya sereke ya vê serdemê temsîl dikin, em dibînin ku ev kovar paralelî pêşketina siyasî û rewşenbîrîya kurdan in. *Rewşen*, bi zimanekî siyasî, xwedî rojevêkê bû. Di dema pevçûnên destpêka salên 1990î de dihat weşandin. Kovareke du-zimanî û damezirîner bû. *Jiyana Rewşen* hewl da ji nasnameyeke siyasî nasnameyeke wêjeyî ava bike. Wê hewl da bêtir li ser wêjê û hunerê bisekine, zimanekî wêjeyî û polîtîkayeke weşanê ya wêjeyî biparêze. Piştî jimara pêncan êdî bi tevahî bi kurdî bû. Ji aliyê din ve, *Rewşenname* armanc dikir bi tevahî bibe kovareke wêjeyî û kurdî. Lê temenê wê kurt bû. Lê rastiyeke eşkere heye ku *Rewşenan* nifşekî wêjeyî afirand û ji wî nifşî di salên 2000î de bi dehan nivîskarên giring ên wêjeya kurdî derketine ku îro serkêşiya wêjeya kurdî dikin.

## 7. Encam

Ev gotara kêr zêde behsa sedsalên rewşenbîrî û wêjeya kurdî dike, helbet pêwîstiya lêkolînên gelekî berfirehtir jî nîşan dide. Wêjeyê li sirgûniyê û ziman û çandê di nav berxwedanê de û qedexeyên li ser nasnameya kurdî, berhemên bi kurdî hatine nivîsîn wek berhemên dekoloniyal bi nav dike. Ji ber vê yekê jî armanca nivîsîna bi kurdî wek dekolonîzekirina welat, çand û zimanê kurdî ye. Ev dekolonîzekirina bi riya edebiyatê xwe vedibêje, şoreşeke bîrdozî bi bîr dixê. Digel ku piraniya weşanxane û kovaran li Stenbolê bûn, piraniya nivîskaran li bajarê xwe bûn. Piştî, di destpêka salên 2000î de, bi guherîna siyasî û zagonî û bi zêdebûna derfetên belavkirinê di nav civakê de, jimara nivîskar û berheman ji nişka ve zêde bû û ev nivîskar xwedî derfeta sazûmankirinê bûn. Navenda weşangeriyê jî hêdî hêdî ber bi Kurdistanê ve, nemaze ber bi Amedê ve dihat ku ev jî mijara lêkolînên berfirehtir e.

## 8. Çavkanî:

- Ahmadzadeh, Hashem. 2015. "Stylistic and thematic changes in the Kurdish novel." *Borders and the Changing Boundaries of Knowledge*, edited by Inga Brandell, Marie Carlson, û Önver A. Çetrez, 219-239. İstanbul: Swedish Research Institute in İstanbul Transaction.
- Ahmadzadeh, Hashem. 2003. *Nation and Novel: A Study of Persian and Kurdish Narrative Discourse*. Uppsala: Acta Universitatis Upsaliensis.
- Alakom, Rohat. 2006. *Kurdên Swêdê (1965-2005)*. Stockholm: Serkland.
- Alan, Remezan û Ergin Öpengin, ed. 2014. *Tîr û Armanc*. İstanbul: Peywend.
- Alan, Remezan. 2016. "Di Nav Modernîzasyonên Der-Ewropê de Tecrûbeyên Kurdan." *Nûbihar Akademî - Hej. 2, 6* : 11-45.
- Alan, Remezan. 2019. *Keşkûl*. İstanbul: Peywend.
- Allison, Christine. 2013. "Memory and the Kurmanji Novel: Contemporary Turkey and Soviet Armenia." In *Remembering the Past in Iranian Societies*, editor: Christine Allison û Philip G. Kreyenbroek, 189-217. Wiesbaden: Harrassowitz.
- Arslan, Mesut. 2014. *Di Dewra Osmaniyan De Weşangeriya Kitêbên Kurdî (1844-1923)*. Teza lîsansa bilind, Mêrdîn: Zanîngeha Artuklu.
- Arslan, Mesut. 2016. "Serbesti Gazetesi (1918-1919) ve Bedirxanîler: Celadet Alî Bedirxan'ın Yazıları ve Kürtlere Dair Bazı Haberler." *Kürdoloji Akademik Çalışmalar Cilda 2*. Hasan Karacan (ed.), 393-460, İstanbul: Yargı.
- Arslan, Mesut. 2016a. "Hacî Qadirê Koyî: Serencama Dîwana Wî Li Stembolê û Hevaltiya Wî Bi Keyfî Re." *The Journal of Mesopotamian Studies*, 1/1, 91-101.
- Aydinkaya, Fırat. "Soykırım Dumanları Tüterken Jin Gazetesi (1918-1919)." <https://www.agos.com.tr/tr/yazi/12430/soykirim-dumanlari-tuterken-jin-gazetesi-1918-1919>. (23yê Berfanbarê, 2021).
- Aydoğan, İbrahim Seydo. 2014. *Guman 2 & Edebiyata Kurdî û Romana Kurdî*. İstanbul: Weşanxaneya Rûpel.
- Aydoğan, İbrahim Seydo. 2016. "Nifşên Nivîsa Kurdî wek Civakeke Xeyalî." *Wêje û Rexne 7*, 7-19.
- Aydoğan, Mustafa. 1999. *Pêlên Bêrîkirinê*. Stockholm: Nûdem.
- Cevdet, Abdullah. 2013. "İttihat Yolu" *Di Sedsaliya wê de Rojî Kurd 1913*. Editor: Koma Xebatên Kurdolojîyê. İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Cewerî, Fırat. 2005. *Payîza Dereng*. İstanbul: Nûdem.
- Döğler, Dilaver & Canser Kardaş. 2020. "Wekî Nimandina Zanavê; Ranêzikiya Zimanî û Edebiyatî di Kovara Rewşenê de", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, /1(11), 75-89.
- Eşo, Wezîrê. 2016. *Pirtûkên Kurdî & Li ser Kurdan li Ermenistanê*. Bruksel: Ararat News.
- Galip, Özlem Belçim. 2013. "The Politics of Remembering: Massacres against Non-Muslims in Kurdish Novelistic discourse." Hrant Dink Workshop, 1-2 June 2013. (gotara neçapkirî).
- Galip, Özlem Belçim. 2014. "Where is Home? Re-visioning "Kurdistan" and "Diaspora" in Kurdish novelistic discourse in Sweden." *Nordic Journal of Migration Research* 4, 2: 82-90.
- Galip, Özlem Belçim. 2015. *Imagining Kurdistan: Identity, Culture and Society*. London: I.B. Tauris.
- Ghobadi, Kaveh. 2015. "Subjectivity in Contemporary Kurdish Novels: Recasting Kurdish Society, Nationalism, and Gender." Teza doktorayê, University of Exeter.
- Gorgas, Jordi Tejel. 2020. *Kürt Milli Cemiyeti Xoybûn*. Wergêr: Heval Bucak. İstanbul: Avesta.
- Hassanpour, Amir. 1993. *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985: The Language Factor in National Development*. New York: Edwin Mellen Press.
- Ji Mala Hekariyan E. Rehmî. 1985. "Selaya Şevê", *Jîn 1918, Weşanxaneya Deng*, Vol. 2, Uppsala, 349.
- Jusdanis, Gregory. 1991. *Belated Modernity and Aesthetic Culture*. Minneapolis: The University of Minnesota Press.
- Malmisanij, M. 2007. *The Past and the Present of Book Publishing in Kurdish Language in Turkey and Syria*. İstanbul: Vate.
- McDowall, David. 1996. *A Modern History of the Kurds*. New York: I. B. Taurus.

- Muksî, Hemzayê. 1987. "Edebiyat û Asarên Edebî." Ed. M. Emin Bozarslan. *Jîn*, Hej. IV. Uppsala: Deng, 824-827.
- Mûlayim, Gökhan. 2018. "Publishing the "Unpublishable": The Making of Kurdish Publishing in Turkey." Teza Masterê, Zanîngeha Bogaziçi.
- Naco, Babê. 2017. "Fe'tebiru ya Ulî'l Ebsar." *Hetawî Kurd*. Ahmet Alan. İstanbul: Avesta, 166.
- Önen, Ronayî. 2018. *Ziman û Netewesazî & Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*. Wergêr Şehmus Kurt. İstanbul: Peywend.
- Özmen, Şener. 2015. "Li ser Trawmayê." *Hevpeyvîn ji Serdar Ay û Dawid Yesilmen*. *Wêje û Rexne*, 4, 77-96.
- Qaso, Laleş. 2003. *Ronakbîr*. Stockholm: Pelda.
- Reşîd, Tosinê. 2012. "Sovyetler Birliği'nde Kürt Edebiyatı." *Inatçı Bir Bahar & Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*. Wergêr: Kenan Güneş, 202-212. İstanbul: Ayrıntı.
- Said, Edward. 2016. *Kültür ve Emperyalizm*. Wergêr: Necmiye Alpay. İstanbul: Hil.
- Scalbert Yucel, Clémence. 2012. "İsveç'te Kürt Diasporası: Dilbilimsel Bilginin Korunması, Üretilmesi ve Yayılması." *Inatçı Bir Bahar & Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*. Editor: Vecdi Erbay, 551-576. İstanbul: Ayrıntı.
- Scalbert Yucel, Clémence. "Languages and the Definition of Literature: The Blurred Borders of Kurdish Literature in Contemporary Turkey," *Middle Eastern Literatures*, 14:2, 173, DOI: 10.1080/1475262X.2011.583467 (12ê Adarê, 2020).
- Scalbert Yucel, Clémence. 2018. *Kürt Edebiyatının Anatomisi*. Wergêr: Yeraz Der Garabedian. İstanbul: Ayrıntı.
- Serdar, Emerikê. 2017. "Yine de Umut Var." *Hevpeyvîn ji Estelle Amy de la Bréteque*. *Kürt Edebiyatı*. Wergêr: Heval Bucak. İstanbul: Avesta, 103-109.
- Sun, Hasan. 2014. "Kürt Romanında Trauma ve Psiko-Politik Ceurelenmişlik: 2000'den Sonra Yazılmış Kürt Romani." Teza Masterê: İstanbul Bilgi Üniversitesi, 2014.
- Tschawish, Mahmood Hama. 1996. *Die kurdische Exilliterature in Deutschland von den 70er Jahren bis heute*. Marburg: Tectum Verlag.
- Yekdeş, Ömer Faruk, and Servet Erdem. 2014. "Bölücü Bir Edebiyat mı, Bölünmüş Bir Edebiyat mı?: Gec Osmanlı Dönemi Kürt Edebiyat(lar)ı." *Tanzimat ve Edebiyat & Osmanlı İstanbul'unda Modern Edebi Kültür*. Editor: Mehmet Fatih Uslu, and Fatih Altuğ, 327-357. İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
- Yeşilmen, Dawid. "Lêkolînên edebiyata Kurdî li Kafkasyayê." [http://yeniozgurpolitika.net/lekolinen-wejeya-kurdi-li-kafkasyaye/\(20ê Cotmehê, 2018](http://yeniozgurpolitika.net/lekolinen-wejeya-kurdi-li-kafkasyaye/(20ê Cotmehê, 2018).
- Zeraq, Dîlawer. 2016. "Li ser Salên 90î" *Hevpeyvîn ji Dawid Yeşilmen û Serdar Ay*. *Wêje û Rexne*, 7 116-135.
- Zeraq, Dîlawer. 2018. *Bêjara Neteweparêz di Kovara Hawarê de*. Diyarbakır: Lîs.